

# PIRS

## Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye.

Kovara Pirs... .. Hejmar 54 ... .. Zivistan 2016... .. Buha (200) L.S

[kovarapirs@yahoo.com](mailto:kovarapirs@yahoo.com)

<b>Pêşgotin</b> .....	2
<b>Gotar:</b>	
- Ziman û Şaristanî – Merwan Berekat .....	3
- Sînema Kurdî Di Navbêna Huner û Pişe De – Ebdilqadir horî.....	19
- Mîr Emîn Alî Bedirxan: 1851 – 1926 (Danerê Rengên Ala Kurdistanê) Konê reş	23
- Êzdî û Xelek – Çixiz – Silêman Cefer.....	27
***	
<b>Wergerandin:</b>	
- Çima Neteweya Kurd -Nebû Neteweyeke Talanker û Dagîrker? (Beşê duwem) – Mustefa Reşîd.....	6
- Deriyek ji pirtûka Kelîle û Dîmne Ya Felesûfê Hindî Beydebe – Mihemed Ebdo Elî .....	11
- Ji Dîroka Kurd: Kesayetî û Helwest Xelek3 Şah Keyxusro, Rizgarkirê Med Amadekariya Şoreşê: Dr. Ehmed Xelîl - Heyder Omer .....	16
***	
<b>Ziman:</b>	
- Ziman (Veqetandek).....	30
<b>Wêje:</b>	
- JI SÎTAVA PÊR – Merwa Birîm – Kurteçîrok.....	32
- Ji Ber Ku Ez Jin im – Vejîna Kurd – Bîrewerî.....	34
- Wergerandina Hin Çikdanên Wêjeyî Yên ``NADRA HESEN`` - wergerandin: Merwan Berekat.....	36
- NASNAME – Zekeriya Efrîn – Helbest.....	37
- Em û Şevê – Helbest – Hêvîn Hiso .....	38
- Ewê Vegere – Helbest – Dr. Yûsif Îbiş.....	37
- Nerastî Bû – Helbest – Şivanê Xeyalan.....	37
***	
<b>Lêkolîn</b>	
- Komara Mehabadê Ya Kurdistanî – Memê Alan .....	39

**Pêşgotin:**

Ziman, mîna hemû giyanewerên zindî zidiyane ye, bi gelek rêbaz û alavan jiyana wî pêşve diçe û dewlemend dibe, yek ji wan rêbazan wergerandin e. Wek tê nasîn di riya zimên re têkiliyên miletan ên raman, hestewarî û nayabdariyê çêdibin. Ji ber wê jî wergerandin roleke pir sûdar di van waran de dilîze, û geşedaneke mezin û rasteqînî dixê pêşvebirina zimên.

Bi riya wergerandinê hemû şaxên zanyariyê ji berhemên miletekî derbazî jiyana miletekî din dibin, û bi wê derbazbûnê pênaseya pêşketina miletan û asta wan di warên raman, wêje, koltor, danûstandina civakî... tê nasîn.

Di serdemên dîrokî de, nemaze di dema niha de, bizava wergerandinê di zimanên cîhanê de pir çalak e, û guhdaneke mezin ji aliyê saziyên ku bi zimên bendewar in ve heye. Ji wê pirtir, li seranserî cîhanê beşê wergerandinê di zanîngehan de heye, û bi şêweyên zanistî karê wergerandinê tê kirin. Bi karê wegerandinê, ziman ji neyîniyên zimanewaniyê hêdî hêdî ji nav xwe radike, yanê ew di pir waran de, nemaze ji aliyê têrman de xwe dewlemend dike, û dibe zimanekî li gor demê, û di kevniyaya xwe de namîne, ji ber ku ziman ne tenê rêziman û rastnivîs e.

Herweha rola wergerandinê ne tenê di warê zanistî û zimên de sûdar e, lêbelê ew gelek tiştin nû derbazî jiyana wêjeya gelan dike, ango dema wêjeya miletekî tê wergerandin ew sêwene nû bi xwe re tîne, û geşedaneke dixê wêjeya wî miletî.

Bêguman berî her kesekî rola nivîskar, wêjevan û zanyaran di warê wergerandinê de heye, her yek ji wan, nemaze yên ku bi pirtirî zimanekî dinivîsîn dikarin li gor kanebûna xwe di wergerandinê de bixebitin. Lê mixabin ta roja îro Kurd di vî warî de – wergerandinê de – pir lawaz in. Bêguman sedemên wê lawazbûne jî hene, lê li gor derfetên ku hene guhdan pê nehatiye kirin. Yek ji sedemên wê ew e, ku piraniya nivîskar, wêjevan û berhemdarên Kurd, bê sazî û piştevan in. Ew dixwînin, dinivîsîn û berheman amade dikin, lê li dawiyê divê ew bi xwe jî berhemên xwe çap û belav bikin. Ev jî bandoreke neyînî ye pir mezin li pêşvebirina zimên û bizava wergerandinê dike. Hêvî ew e, ku ji aliyê sazî û tevgera siyasî ya kurdî ve bendewariyek bi nivîskar, wêjevan û pênûsên ku di warê wergerandinê de dixebitin were kirin.


## Ziman û Şaristani

**Merwan Berekat**



*Bêguman rola zimên di avakirina hemû warên şaristaniyê de roleke girîng e, û pêşketina şaristaniya miletekî ew jî roleke bingeîn di jiyana zimanê wî de dilîze. Lewma jî di navbera pêşketina şaristaniya miletekî û pêşketina zimanê wî de pêwendiyeye herdemî heye.*

*Dema pêşketin dikeve jiyana wêje, raman, felsefe, koltor, warên perwerdekirinê û hemû karûbarên girêdayî bi sistema civakî ya miletekî, bandora wê pêşketinê bi şewakî erênî li jiyana zimanê wî jî dibe. “Pêşketina zimanê her miletekî bi pêşketina wî ya şaristani ve tê girêdan”.*



**Detaneya Gilgamîş**

*Bêguman dema miletek ji jiyana gundîtî û çandiniyê derbasî jiyana bajarvaniyê dibe, gelek guhartin di jiyana wî de çêdibin, ew millet ji jiyana çandiniyê derbasî jiyana bazirganî, pêşesazî û warên zanistiyê dibe. Piştî ku ew millet derbasî ew jiyana nû dibe, hêdî hêdî zimanê wî jî di hemû waran de nûjen û firehtir dibe.*

*Dema miletek şaristaniya xwe bi zimanê xwe yê zikmakî ava bike, bêguman ew bi navê wî tê danasîn, û kesek nikane wê şaristaniyê bi dîroka miletekî din ve girêde. Lê dema ku miletek hemû warên şaristaniya xwe bi zimanê miletekî din ava bike, ew millet ne xizmeta dîroka xwe û ne jî xizmeta zimanê xwe dike, û li dawiyê ew şaristanî ne bi navê wî tê nasîn. “Eger şaristanî bi zimanê kîjan milletî were avakirin, ew şaristaniya bi navê wî milletî tê nasîn”.<sup>1</sup>*

**- Bandora xwaknîgariyê li jiyana zimên:**

*Siruşa xaknîgarî ya her welatekî bandora xwe li zimanê rûniştimaniyên wî welatî dike, û li gor vekolînên zimanzan, lêkolînan û dîroknasan, milletên ku di xaknîgariyên beyabanî de dijîn zimanê wan kêmbêje ye, lêvkirina wî sert û giran e, rêzimanê wî ne li saz e û ew nikare di warên zanistê de rola xwe pir bilîze. Lê milletên çiyayî û deştî (yên ku li çiya û deştan dijîn) zimanê wan pîrbêje, nazik û dewlemend e, û kare rola xwe di hemû warên zanistê de bi şewakî pir fireh bilîze.*

*Eger mirov li dîroka şaristaniya mirovahiyê vegere, dê bibîne ku di hemû serdemên dîrokî de şaristanî li çiya, deşt û nêzîkî jêderên berdewamiya jiyane wek çem, derya û cihên çandiniyê hatiye avakirin, û zimanê wan jîngehan ji yê jîngehên beyabanan dewlementir bû.*

**Ma gelo kesek kane li pêş pêşketina zimên bisekine?!**


*Bêguman kesek nikare li pêş pêşketina zimên, nemaze zimanê milletên zindî bisekine û wî di yekastê de rawestîne. Ji ber ku dema miletek zindî be, ew hertim û bê rawestandî hewil dide, ku jiyana xwe berve şaristaniyê bibe, belkî di hin waran de bi ser nekeve, û di hin waran de jî bi dijwarî encama serkeftinê werbigre, lê bêguman ew di gelek waran de encama serkeftinê werdigre.*

---

<sup>1</sup> - Hinrî Dolakruwa. Ziman û Raman. Çapa 1930î rûpel 43.

*Di wan hemû gavan de ziman jî liber xwe dide, ku pêşketinê tixe jiyana xwe. Ango şaristanî û ziman gav bi gav, qonax bi qonax di zagonên pêşketinê re derbaz dibin, lê dema miletek di hemû warên jiyana xwe de li paş mabe, zimanê wî jî li paş dimîne.*

*Di gelek serdemên dîrokî de hin miletan pêşvebirin xistin hemû warên jiyana xwe, nemaze warê zanistî, û wan hemû şaxên zanistê bi zimanê xwe nivîsandine.*



*Ji ber ku rewşenbîr û pisporên miletên din dixwastin wan zagonên zanistî binasin û derbasî jiyana miletê xwe bikin, wan xwe fêrî wî zimanî dikirin, û di riya wê fêrkirinê re gelek bêje û têrm derbasî jiyana zimanê wan dibûn. Lewma jî zimanê ku di warê zanistî de li pêş be, wek zimanê Îngilîzî yê dema niha, ew dibe zimanekî cîhanî.*

*Di serdema imperatoriya Yûnanî de, Yûnanan hemû şaxên zanistê bi zimanê yûnaniya kevnar dinivîsandin, nemaze di warê felsefî de. Zanyarên gelên din dixwestin felsefa yûnanî binasin, bixwînin û di nav miletên xwe de bidin xwendin. Wan berî her tiştêkî xwe fêrî zimanê yûnanî dikirin, di riya wê fêrkirin û xwendinê re gelek bêje û têrmên zimanê yûnanî derbasî zimanên wan dibûn. Ango zimanê ku di warê şaristanîyê de li pêş be, bandora xwe ya zimanî li gelek zimanan dike.*

*Mirov, ziman û şaristanî jiyana in..... Belê, miletê ku li zimanê xwe xwedî dernekeve, ew miletekî pûç e.*



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*



*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

## **Xelekên Gotaran: Kurd û Dagîrker**

### **Xelek 30**

### **Çima Neteweya Kurd**

### **Nebû Neteweyeke Talanker û Dagîrker?**

### **(Beşê duwem)**

*Daku her pirojeyeke talankerî û împêratorî pêkwer e, divêt çar hêmanên bingehîn li meydanê hebin: Îdeologiya talankeriye, rêveberekî tund û zordar, dewleteke navendî hêzdar û hêzeke şervan û perçiqandêr. Gelo heya çi radeyê ev çar hêman bi hev re di dîroka neteweya Kurd de hebûn?*

#### **Îdeologiya talankeriye:**

*Pêwîstiya pirojeya talankeriye bi îdeologiya (baweriya) talankeriye heye. Erka wê ew e, ku gel yeko yek û çîn bi çîn bicivîne, wan di bin yek alayê de û ji bo yek armancê bike yek, û wan ber bi wê rewşê de tûj bike ku ew bê sînor xwe bi hebûn û giyanê xwe gorî bikin. Ev îdeologiya talankeriye dikare ayînî be (wek Aşûriyan di bin alaya xweda Aşûr de, wek Îbraniyan di bin alaya xweda Yehwa de, wek Bîzantiyan di bin alaya Kirîstiyaniye de, wek Erebi û Turkan di bin alaya Îslametiye de û wek Megolan di bin alaya xwedayê esîmanê Şamanî de). Ev îdeologiya talankeriye dikare neteweyî be jî, ku bi*

awayekî şaristanî hatiye boyaxkirin (wek Yûnan, Roman û koloniyalîzma ewropayî ya nû). Yan jî dikare neteweyî nijadî be (wek Almaniya nazî û Îtaliya faşî).

Mijara Kurdan ew bûye ku „çanda pêkhatinê“ ya kurdistanî wek encama „erdnîgariya têrbûnê“ peyda bûye. Ji lewre ew bi kêrî îdeologiya talankeriyê nehatiye. Wê „ayîna Yezdanî“ pêk aniye. Ev ayîn ayîneke aştxwaz û mêşin bûye; ew ne talanker e, ne jî arezûya zor û perçiqandinê li ba wê heye. Heya niha jî bingehên wê yên fîlozofî bi şewazên cuda di ayînen Bozî, Zerdeştî, Êzîdî, Yarsanî (Kakayî), Alewî (Halawî), Dirûzî, Babî û Behayî de mane.

Bi bandora „çanda pêkhatinê“ ya kurdistanî, Kurdan ji bo xwe Îslametî nekirin destek ji bo pirojeyeka talankerî împeratorî; wek ku hevsêyên wan Erebb, Turk û Farisan kirin. Tevî ku Dewleta Eyûbî di serdema îslamî de ji dewletên Kurdan ya herî mezin bû jî, lê sultanên Eyûbiyan ew welatên ku serdarî lê kirin, nekirin milk û samanê Kurdan. Ne jî zimanê kurdî li ser wan gelanferz kirin û ne jî xêr û bêrên wan welatan talan kirin ku pê bajar û gundên Kurdistanê ava û geş bikin. Bi vajayî wê, Dewleta Eyûbî hêz û şiyana şervanên Kurd xiste xizmeta berevaniya gelên Rojhilata Navîn li dijî talana Firengan û ji bo xizmeta „Dewleta Xîlafeta Ebasî“; hem di warê siyasî, hem jî di warê çandî de. Sultan Selaheddînê Eyûbî xwe di nameyên xwe de ji bo xelîfeyê Ebasî li Bexdadê wek „xizmetkar“ bi nav dîke<sup>1</sup>.

### **Rêveber, dewlet û hêzdarî:**

Çanda pêkhatinê ya kurdistanî di hişyariya kurdî tevayî da ramana „rêveberiya bijarte“ çespandiye. Mebesta me rêveberiya olîgarşiya êlîtiyê ye (serekên hoz û êlan). Li gor vê ramana siyasî rêveberî her di destê “civata hilbjêr” (Kon Gir) da bû, û ne di destê (rêveberekî/serwerekî) yekane de bû. Divêt em bêjin ku şewazê rêveberiyê (Kon Gir) di navbera piraniya gelên ariyanî de mîraseka hevbeş bû. Ew tê wateya têgîna „Congress“ ya siyasî ku ji (Kon Gir) peyda bûye. Ev ramana siyasî di kesayetiyê kurdî de wisa rûniştîye

ku ew herdem li dijî sernermiya beramber „rêveberê yekane“ ye, û herdem ji desthilata navendî direve.

Ev diyarde bixwe di dîroka Sûmeran de jî xuyaye, ku ew ji erdnîgariya çanda Guzana ya kurdistanî derhatine (ji wir koç bûne û çûne başûrê Mêzopotamiya). Ev diyarde di ramana siyasî de li ba Gutiyân, Hûriyan û Mîdiyan (pêşiyên Kurdan pêş serdema Îslametiye) jî aşkera ye. Em wek nimûne dibêjin ku endamên komîteya (Kon Gir) ya Gutî ji nav xwe kesê herî hêja û jîr wek padîşah tenha ji bo şeş salan hildibijartin. Hilbijartina wî nedihate nihkirin, tenha di hin rewşên awarte de. Hilbijartina „Deyako“ (Dehyako) wek yekem padîşahê Padîşahiya Madan bi lihevkirina endamên (Kon Gir) ya êlên Madan bû<sup>ii</sup>.

Di dîroka kurdî de gelek nimûne hene ku endamên (Kon Gir) ya kurdî rewîştên pîroziyê nedidan ew rêveberê bilind ku dihate hilbijartin; wek ku Farisan pêş serdema Îslametiye dikir û wek ku Ereb û Turkan jî di serdema Îslametiye de dikirin. Dema ku padîşah dibû dîktator û guh nedida endamên (Kon Gir), ew li dij wî radiwestiyan, û ev yek dibû sedema berberî û pevçûnê ku bi encama wê padîşahî lawaz dibû û diket destê dijminan. Nimûneyê herî diyar padîşahiya Mîdiya ye ku di sala 550-î p.z de kete destê Farisan; bi sedema hêrsbûna hin serekên Madan beramber zordestiya padîşahê Madan yê dawîn Ezdehak<sup>iii</sup>.

Nimûneya din ji Dewleta Eyûbî ye. Tevî ku Selaheddîn sultaneke bi saw bû, dîsa jî hin serekên êlên Kurdan hin çar bi hişkî li dijî fermanên wî derdiketin. Lê wî hêrsa xwe digirt û bi awayekî nazik bi wan re dida û distand. Heyanî kesên ne Kurd yên li gel wan ji vê yekê mat diman. Rastî ew e ku Selaheddîn rastiya ramana kurdî di warê desthilatdariyê de baş nasdikir. Ev jî bû yek ji sedeman ku wî êdî koleyên Turkan bi hejmareke mezin xistin nav leşkerê xwe, ji ber ku wan fermanên wî bê „erê-na“ pêkdihanîn. Sultanên din yê Eyûbiyan jî li ser şopa wî çûn, û di encamê da Dewleta Eyûbî di sala 1250-î p.z de kete destê Memalîkan<sup>iv</sup>.



Ji ber hawîrdora çandî ya guncaw ji bo pêkhatina îdeologiya talankeriyê peyda nebû, û ramana siyasî ya ji bo peydabûna rêveberê yekane, û ji bo avakirina dewleta navendî tund pêknehat, helbet, tişteki surîştî bû ku hêza şervanî ya talanker û perçiqandêr jî peyda nebe, ya ku tûjbûna xwe ji ramana talankeriyê distîne û fermanên rêveberê yekane bê „erê-na“ pêktîne û bê sînor amade ye ku xwe gorî bike; û di warê rewîştî û derûnî da amade be ku zora bê sînor pêkbîne.

### **Gel û çarenûs:**

Ji aliyê mirovayetî û rewîştî da neteweya Kurd bextewar e ku nebû neteweyeke talanker, û serbilindiya xwe li ser dagîrkirina welatan, rijandina xwînê, kolonîzekirina gelan, standina samanên xelkê û ajotina cemawerê dîl û koleyan ber bi bazarên firotina mirovan ava nekir. Ji lew ra tişteki surîştî ye ku ramana neteweya Kurd ramanê berevanî be, li ser aştxwaziyê hatibe avakirin, û ne ramanê êrişkar be ku armanca wê kolekirina gelan be.

Lê belê, gotineka pêşiyar heye dibêje: **Her tiştê ku ji sînorê xwe derbas bû, vedigere û dibe dij**; û ev rewş bixwe bi serê neweteya Kurd hatiye. Çanda wê ya berevaniyê û aştxwaziyê kir ku nikaribe li hember xwediyên ramanên talankeriyê li ber xwe bide. Xwediyên wan ramanan tenha zimanê hêza tund fêhm dikin. Encam ew bû ku Kurdistan bi dirêjahiya 25 sedsalan bûye pirêzeya dagîrkeran. Van dagîrkeran bi wê jî nekirin ku Kurd kolonîze kirin, şiyana wan û xêr û bêrên wan jî xistin xizmeta pirojeyên xwe yê koloniyalîst, hên hatin û dîroka Kurdan jî wendayî dikin, çanda wan a niştîmanî kavi dikin û kesayetiya wan a neteweyî jî çepel dikin.

Belê, çanda pêkhatinê ya kurdistanî aştxwazî di serdemên dagîrkeriyê de hate çepelkirin û bû çanda „destjixweberdanê“, belkî li ba hin Kurdan jî bû çanda „koletiyê“ û bi xwe re çanda siyasî ya tirsonek û revok peyda kir. Encama şoreş û cangoriyên sedsala 19-an ew bû, ku Kurdistan êdî ji aliyê çar dewletan de hate dagîrkirin ku pêş wê tenha ji aliyê du dewletan de dagîrkirî bû. Û piştî ewqas

*şoreş û cangorî bi dirêjahiya sedsala 20-an va ye Kurdistan hên jî dagîrkirî ye, û va ye pirojeyên „hemwelatîyê“ di çarçewa dewletên dagîrker de pirojeya rizgarkirina Kurdistanê dide aliyekî.*

*Pirs niha ev e:*

*Gelo aliyê neyînî yê çanda pêkhatina kurdistanî li ser me çarenûseke ebedî ye?*

*Gelo çarenûsa Kurdan ew e ku ew ta ebed di vê rewşa kambax de bimînin?*

*Helbet, na. Rola gelan di çêkirina çarenûsa wan de pir girîng e, û gelê Kurd jî ne awarteya vê qeydê ye. Tiştê ku ji Kurdan re pêwîst, ji bo çêkirina çarenûsa xwe, ew e ku ew xwe ji vê rewşa kambax derxin, ku ew çanda xwe ya kurdistanî resen ji gil û gemara serdemên dagîrkeriyê paqij bikin, wê ji çanda tirsonek û revok azad bikin, û kesayetiya kurdî ji rewiştên koletiyê rizgar bikin.*

*Bi gotineka hên zelal: Tiştê ji Kurdan re pêwîst ew e, ku ew bîreweriya kurdistanî avabikin, hişyariya kurdistanî pêkbînin, hevgerêdana xwe ya kurdistanî biçespînin û nixên kurdistanî xurt bikin. Bi saya van çar pêkanînan ewê bikaribin dawiyê li vê rewşa neteweyî û mirovayetî awarte û bi şerm bînin.*

*Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd di radeya yekem de berpirsiyarên pêkanîna vê yekê ne.*

***Û çî dibe bila bibe, divêt Kurdistan rizgar bibe !***

30.12.2016

#### **Jêder:**

<sup>1</sup> Abo Shame: Oyon Al Rawdateyn, 3/67, 86, 88.

<sup>1</sup> Samuel Kramer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 79. Dyakonov: Midia, rûpel 111, 112, 115-116. Abdulhamid Zayed: Rojhilatê hemdem, rûpel 574-575.

<sup>1</sup> Herodotos: Dîroka Herodot, rûpel 93.

<sup>1</sup> Ibin Shedad: Al Newader Al Sultaniye, rûpel 64-65. Ibin Shahin al Meleti: Seyrana efsaneyan, rûpel 63-64.

**Deriyek Ji Deriyên Pirtûka Kelîle û Dîmne  
Ya Feylesûfê Hindî Beydeba..**



*Wergerandin ji Erebî:  
Mihemed Ebdó Elî*

**Deriyê Geştevan û Zêrker**

Qeral Debşelîm bi beydebayê feylesûf re got: Mînakekê li ser ew kesê ku rindiyê di ciyê ne guncav<sup>2</sup> de dike, û spasiyê jî li ser dixwaze ji min re wîne.

Feylesûf got: Qeralê min, rindiya ku ji kesê ne spasdar re were kirin, li ber bê diçe, û xwedanê rindiyê jî pir poşman dibe, lê dîsa jî tov<sup>3</sup> ji tova rindiyê rindtir tuneye ku di dilê spasdaran de zû şîn bibe, û ne jî bazirganiyeke jê bikêrtir heye. Gerek e mirov rindiyê bi heryekî bike, çinkî eger rindî li ba xelkê winda bû, li ba Xwedê winda nabe!. Nemaze jî kesên spasdar û dilsoz, û eger payedariya mirov çi be, belkî rojekê ji rojan mirov bigerekî wî bibe, û ew di ber barê wî de rabe.

Û eger qerêl û hişmendana xwastin rindiyê bi yekî bikin, gerek e wê rindiyê di ciyê wê yê guncav de dînin, û ji ewê ku nikane di ber de rabe, û ne spasdar be nekin. Û berî ku qeral kesekî ji bo rindiyê vebjêrin, gerek e karûbarê wî, dilsozî, spasdarî û viyandariya wî baş nas bikin; û eger mirovekî ku bi durustî û dawpakiya xwe navdar be, û bê ku ew ezmûn û taqe bibe, rindî vêre were kirin, qeral bi wê yekê xwe dixwe nava metirsiyê, û xwe dide ber nerindî û mirinê jî. Tu nabînî ew bijîşkê hişmend ê




<sup>2</sup>.Guncav: Lêhatî, minasib.

<sup>3</sup>.Tov: Bidarê بذار.

dilovan, nexwêş tenê bi çavlêdanê derman nake, berî dermankirinê ew rewşa wî nas dike, tamarên wî dipelîne<sup>4</sup>, xwezaya wî û sedema derdê wî nas dike, û eger ew hemî nas kirin, wê hîngê wî derman dike. Û gerek e di wî warî de, raku mirovekî xwe ji ber mirovantiyê, yan jî kesek ji ber rûmetbilindiya wî, nankor be jî, gerek wî jî li wê pîvanê bibe, çinkî ew jî bi rûmetkirina wan rûmetdar dibe. Û bila ji bo dûrbûnê jî kesekî ji rindiyan bêpar nekin, ne jî qelsekî ji bo qelsiya wî bêpa r bikin, nemaze eger ew nas bike, ku çi ji wî re tê kirin, û ji bo wê rindiyê jî spasdar be, û hatiye gotin: Gerek e hişmend, ta lawiran jî kêm nebînin, lê gerek e ew wan ezmûn û taqe bike, û tiştê ku ji wan re bike, bila bi qaserî tiştê ku ji wan tê be, çinkî belkî xêr li ba ewê ku gumana şer jê dibe jî hebe, û şer jî li ba ewê ku xêr jê hêvî dibe, bê dîtin!

Qeralê min, sinciyên afrandeyan jî têvel in, û ji ewên ku Xwedê afrandine, û li ser çar lîngan, yan diduyan dimeşin, yan bi du baskan difirin, yan jî di avê de avcenyê dikin, ne ji mirov rindtir in, lê digel wê, belkî pêwîst bibe, ku haya hişmend ji mirovzad<sup>5</sup> hebe, û bi yekî jî ji wan ewle nebe; lêbelê kanibe, fistekekî di devzendkeke<sup>6</sup> xwe re têxe û di yê din re derxe, û kanibe tilûrekî birînker li ser destê xwe dîne, û tenê eger wî nêçîrek girt tiştêkî jê re dihêle. Çinkî ji mirovan xêrxwaz jî û bedxwaz jî hene, û belkî di nava hin lawir û



<sup>4</sup>.Dipelîne: Vedijo يتلمس.

<sup>5</sup>.Mirovzad: Însan.

<sup>6</sup>.Devzendk: Serê piyê miltên (kurtik) ku dest tê re derdi keve كم القميص

cinawiran de yê ji mirov dilsoztir, li ser rûmeta xwe bi qîretir, û ji bo rindiyê spasdartir jî hebin. Û di wê derbarê de hin hişmendan mînakek gotine. Qerêl got: Ew çawa bû?

Feylesûf got: Hatiye gotin, ku hinekan bîrek li ser rêkekê kula bû, û mirovekî zêrker, marek, meymûnek û pilingek têwer bûbûn. Mirovekî geştevan jî di wir re derbas bû, xwe bi ser bîrê de xwar kir, û mirov, mar, meymûn û piling di binê wê de dîtin. Ew bi xwe re ramî û got: Ji bo çêsezaya pişdawiya xwe, ez karekî ji bo derxistina vî mirovî ji nav van neyaran û rizgarkirina wî rindtir nabînim ku bikim!. Çinkî hatiye gotin: Ji çêsezaya rizgarkirina mirovekî ji mirinê mezintir tune, û ji bedsezaya kesê ku kane bike û neke-çiqas karekî dijwar be, ji bilî xwekuştinê- mezintir jî tune. Û wî benek anî û berda bîrê, lê ji ber ku meymûn sivik bû, xwe pê ve girt û ji bîrê derket. Û carek din ben berda bîrê, vê carê mar xwe lê aland û derket. Û cara sisiyan ben berda binê bîrê, vê carê piling xwe pê girt û ew jî derket; wan her siyan ew spasdar kir, û jê re gotin, vî mirovî ji bîrê dermexe, çinkî tiştê ji mirov nankortir tune!. Paşê meymûn jê re got: Mala min li ciyekî nêzîk bajarekî ye, jê re dibêjin Niwaderext. Piling jî got: Ez jî li kêleka wî bajarî di daristanekê de me. Mar jî got: Ez jî di sûra wî bajarî de me, eger rojekê ji rojan tu di ba me re derbas bû, û tu bi pêdviya me bû, deng li me bike, daku em werin ba te, û ji bin rindiya te derkevin. Lêbelê ji ber kêmspasdariya mirov, geştevên pir guh neda gotina wan, û benê xwe berda binê bîrê û zêrker derxist; ew jî jê re daket serçokan û regot: Te rindiyek bi min kir; eger rojekê ji rojan tu di bajarê Niwaderext re derbas bû, li mala min bipirse, ez zêrker im û navê min filan e, belkî ez kanibim rindiya ku te bi min kir li te vegeînim. Û zêrker çû bajarê xwe, û geştevan jî bi riya xwe de çû.



کتاب: کلیة ودعة: الأسد ودعة: ابن توتی، سوریه، عام (۱۲۰۰-۱۲۲۰م)

Piştî wê, lê hat û karekî geştevên li wî bajarî çêbû, û dema ku ew çû bajêr, meymûn pêşwaziya wî kir, jê re daket serçokan û lêborîn jê xwast û got: Tu zanî tu arziya meymûnan tuneye, lê li vir rûne ta ez tîm, û meymûn çû, meyweyên xweşik jê re anîn û li ber destên wî danîn, û wî jî qaserî kanî jê xwar.

Paşê geştevan çû ta gihîşte ber deriyê bajêr, li wê derê piling pêşwaziya wî kir, û xwe li pêşiyê berda ser zemînê, û jê re daket serçokan û got: Te rindiyek bi min kir, tu katekê raweste, ta ez vedigerim, û piling çû derbas qonaqa qerêl bû, keça wî kuşt, xemla wê bir, û bêyî geştevan zanibe ji kû aniye, li pêşiyê danî.

Wî di dilê xwe de got: Eger van lawiran ev tiştina ji min re kirin, ma çawa ku ez herim ba zêrker?!. Eger ew desteng be, û tişteki wî tunebe, ewê vê xemlê bifroşe, û ew buhaya wê jî zane, û paşê dê buhaya wê bibe, û hinekî jê bide min, û hinekî jî ji xwe re bibe. Û wilo wî berê xwe da mala zêrker, û dema ku ew dît, bixêrhatina wî kir, û derbas mala xwe kir. Lê gava çavê xwe li xemla ku bi geştevên re bû ket, wî ew nas kir, ji ber ku wî ew ji keça qerêl re çêkiribû. Zêrker got: Dilvehesî be ta ez ji te re xwarinê tînim, ez bi tiştê ku li mal heye qeyîl nabim, û ew derket û bi xwe re digot: Fersenda min bi destê min ket. Ezê herim ba qerêl û jê re hewaldim, bi wê yekê payaderiya min jî wê li ba wî bilind bibe. Û ew çû ber deriyê qerêl, û xeber jê re şand, ewê ku keça te kuştiye û xemla wê biriye li ba min e, qerêl leşker şandin û geştevan anîn, û gava ku li xemlê nêrî, fersend nedayê ku baxive, û ferman da, ku wî bêşînin, li bajêr bigerînin û paşê bi xaçkirinê bikujin.

Û gava ku wergî<sup>7</sup> kirin, geştevên dagirî û bi dengekî bilind got: Gava meymûn, mar û piling gotin ku mirov nankor û ne spasdar e, min bi şîreta wankiri ba, eger bi ya wan kiriba, ezê negihîştama vê belayê, û ev gotina dubare kir.

---

<sup>7</sup>.Wergî: Wilo, wiha, bi wîrengî..

Wê hîngê mar gotina wî bihîst, ji qulika xwe derket û ew nas kir, û rewşa wî lê zor hat, û karê xwe kir ku wî rizgar bike, û xuşî û çû ta gihîşt ba kurê qerêl û pê dada. Wê hîngê qerêl zaniyar civandin, daku wî derman bikin, lê wan nikanî tiştê jê re bikira!. Û paşê mar çû ba dosteke xwe ji pêriyan, û rindiya ku geştevên pê kiribû jê re hewalda, û niha ketiye çî deraqî jî jê re got, wê hîngê, dilê wê pê şewitî, û rabû çû ba kurê qerêl, lê diyar bû, û jê re got: Tu çak nabî, taku ew mirovê we bi setemkarî seza kiriye, te derman neke.

Û mar jî çû zîndanê ba geştevên û jê re got: Ev bû sedema ku me nexwast tu rindiyê bi wî mirovî bikî, û te guhdariya me nekir, û rabû çilone<sup>8</sup> ku sûde ji bo jehrkujê tê de hebû dayê, û jê re got: Eger ji bo dermankirina kurê qerêl hatin ba te, ji ava vî çolyî bidê, û ewê çak bibe, û eger qerêl li ser rewşa te pirsî, jê re rastiyê bêje; û bi ya Xwedayê gewre tuyê rizgar bibî!

Wê hîngê, kurê qerêl ji bavê xwe re got, wî bihîst ku yek dibêje: Tu çak nabî taku ew geştevanê bi setemî hatiye zîndankirin te derman neke. Qerêl geştevan anî, û jê xwast ku kurê wî derman bike. Wî got: Ez dermankirinê nizamim, lê ezê ji ava çiloyê vê darê bi kurê te bidim vexwarin, û bi ya Xwedê ewê çak bibe, û herwiha av da kurik û ew çak bû. Wê hîngê qeral jî pir şa bû, û çêroka wî jê pirs kir, wî jî jê re hewalda, qerêl jî ew spas kir, baxşîşeke baş dayê, û ferman da, daku ji ber derewa zêrker, û sezakirina rindiya geştevên bi nerindiyê, wî bi xaçkirinê bikujin.


Paşê feylesûf ji qerêl re got: Kiryara zêrker bi geştevên re, piştî ku wî ew rizgar kir, û nankoriya wî vê re, û spasdariya lawiran jê re, û rizgarkirina wan jî ji wî re, serborek<sup>9</sup> e ji dersxwazan re, ramanek e ji bo ramyaran, û perwerdeye ji bo ku rindî û tiştên baş bi kesên dilsoz û comerd re werin kirine, ji ber ku ramana rast, anîna xêrê û têvedana belayan jî tê de tê dîtin û zanîn.

---

<sup>8</sup>.Çilo: Pelên daran.

<sup>9</sup>. Serbor: di ser re borî û sûd jê dît, serpêhatî. درس وعبرة

**Ji Dîroka Kurd: Kesayetî û Helwest Xelek 3**  
**Şah Keyxusro, Rizgarkirê Med Amadekariya Şoreşê:**



**Dr. Ehmed Xelîl**  
**Werger: Heyder Omer**

*Piştî kuştina Xeşterît, kurê wî Keyxusro / Key Exsar şûna wî girt (di navbera salên 625 – 585 b. z de hukudar bû), Key paşnav e, û wateya wê şah e, û wateya navê wî şahê wêrek e. Ewî taybetiyên rêvebiriyê hebû; hizra steratîcîk û dîplomatiika piragmatîk û rêvebiriya hişkber berztirînên wan taybetiyan bûn.*

*Ewî pirojeya Med bo rizgarkirina ji bin destên şahnişîna Aşûr bi dawî hanî, û sê destkeftiyên giring pêk hanîn: Yekem: Piştî têkçûna şoreşa Xeşterît, Med jihev ketibûn, Keyxusro ewana ji nû ve bi ser hevdu kirin, û êlên koçer bi cih û organize kirin, zagonên orgenîzekirina civakê peyda kirin, artêş li ser bingehên nû organize kir, da bi lez tev bigere, tîrkevan ji*

*siwaran cuda kirin, da tirazûwa leşkerî li hember artêşa Aşûr a ku bi hêz û wêrekî û zora xwe navdar e, pêk bîne.*

*Duwem: Keyxusro peyman a aşîtiyê li gel Sikîtan pêk hanî bû, û wî dizanî bû, ku ewana her tim gefan didin şahnişîna Med, û di riya pirojeya rizgarkirina wê de bûbûn kend û bend. Ewî biryar da, ku wan têk bibe, rêvebirên wan bo ahnga xwarinên xwaş û vexwarinên hişbir vexwandin, piştî xwarin û vexwaein, ji hiş ketin, ewî ferman da şervanên Med, ku wan bikujin, pêre jî Sikît bê rêvebiriya çalak man, û kontirolkirina wan hêsan bû. Sêyem: Keyxusro hevbendî li gel şahnişîna Îlam, li başûrê şanhişîna Med, û li gel şahnişîna Babil a Keldan a ku li rojavayê wê dikeve, girêda. Keça xwe Omîd / Emîtis li*



*Neboxeznessir / Buxtunessir; kurê şahê Keldan Nabopolassir mehir kir, da hevbendiyê hêztir bike Wê hingê şahnişîna Babil a Keldan di bin desthilata Sahnişîna Aşûr de bû, û çavên şahê wê Nabopolassir li serxwebûnê bûn.*

*Rizgarkirina Med: Keyxusro amadekariyên leşkerî û hevbendiyên polîtîkî pêk hanîn, û rêvebiriya operasyonên cengê danî Errabxa (Kerkûk), û sala (615 b. z) da ser Nînewa; paytexta, Aşûriyan, lê wê li hember êrişê bi awayê tund berxwe da, pêre jî Keyxusro berê xwe da bajarê Aşûr; paytexta ayînî ya Aşûriyan, ku perestgeha xwedayê Aşûr lê bû, Medan mezintirên rêvebirên Aşûriyan kuştin, û dest dan ser mal û milkên, ku Aşûriyan di dirêjiya dîroka xwe ya împeratorî de ji gelên din standibûn.*

*Dema ku leşkerên Med didan ser paytexta Aşûr, û ew kaviil dikirin, şahê Keldan Nabopolassir sala (612 b. z) tev wan bû, û herdu hevlibendan dan ser paytexta Aşûr, a ku*

*gelên bindestên Aşûr bi (bajarê xwînê) dinavandin. Şahê Aşûr Sîn Şariş Kon (Sarak) kurê Aşûrbanîpal bi wêrekî û tund bervedêriya paytexta xwe dikir, û hêrişkeran sûd ji lehiya çemê Dîcleyê dîtin, û av ber bi sûrên bajêr ên hêzdar de herikandin, û hin warên wan sûran bi ava lehiyê hatin hilweşandin. Piştî cenga tund, şahê Aşûr li bazdanê (revê) mukir hat, û hemî jinên seraya xwe civandin, agir bi wan ve kir û xwe jî avête nav, û hemî sotandin. Herodotus serkeftina Medan dipesine û dibêje: „Medan serî hildan, çek li hember Aşûriyan hilgirtin, û şer kirin, koletî ji ser xwe rakirin û azad bûn. Gelek milletên din, ku çav li serxwebûnê bûn, ketin şopa wan. Bi vî awayî şoreş bi ser ket, û milletên wan deveran gîhan serxwebûba xwe“. Pêximberê Îbranî (Nahom) wê hingê dîl ketibû destên Aşûr li bajarê Nînewa, ewî dilrihetiya gelan ji bo şikestina Aşûr li hember êrişa Med-Keldan, derbiran û got: “Ey şahê Aşûr! Gelê te di xew ve çû, gewreyên*

te gêr bûn, û gelê te li nav çiyay şerpeze bûn, û nema kesek dikare wan bide ser hev. Şikestina te nacebire, birîna te bê derman e, her kesên nûçeya te dibihîsen, li çepikan didin, çimkê kesek jî ji sitema te nefilitî bû” . Rêbazeke cuda: Hevbendiya Med-Keldan ji şahnişîna Aşûr bi xeyd bû, beşekî bajarê Nînewa hilweşand, lê tol ji gel bi gelemperî hil neda. Dyakonov li ser şahên Aşûr dibêje: “Ewana hişk û ter disotandin, agir berdidan gundan û kelehan, zarokên biçûk disotandin, ma sera û perestgeh nesotandin?! Peyker û wêneyên xwedayan neşkandin?! Ma jin bi cilên herifî, dîl negirtin?! Ma Aşûrî mafdar bûn, ku van kiran hemiyay bikin, bê ku bendewarên xeyda xelkên din

bin, yê ku ew jî van kiran bi wan bikin?! Tevî vê jî, kirên Medan û hevbendên wan li hember Aşûriyan ji yê Aşûriyan, ku bi serên gel û netewên din kirin, siviktir bûn”. Her weha Dyakonov diyar dike, ku Medan hemwelatîyên Aşûr ne êşandin, û pişaftina çanda wan nekirin armanca xwe: “Rastî ew e, ku milletê Aşûr ji hole nehat rakirin, belê ewana li Nînewa ya kavihbûyî û bajarên sînardar jiyay, û piştî salan û hîna jî perestvanên xwedayên xwe ne” . Dyakonov dîsan dibêje: “Rizgarî û tenê rizgarî armanca Medan bû, ev rastiyeke numa ye. Şikestin û gêrkirina împeratoriya Aşûr hêmanê bextewariya hemî welatên rojavayê Asiyayê bû” . Keyxusro sala (585 b. z) mir, û kurê wî Ezdehak şûna wî girt.

## Sînema Kurdî Di Navbêna Huner û Pişe De

**Ebdilqadêr Hûrî**

Di destpêka sedsala bîstemîn de, şoreşeke bêhempa di warê wêneyên gerok de derkete holê. Her du birayên fransî Lumière (Lumiyêr) cara yekemîn benên filmên ku tevgera mirovan derdixe xistin meydanê, û dîrokeke nû ji hebûna kar û xebata mirov û kompaniyên (şirketan) re li ser asta dinyayê, bi navê bazara film û sînemayê rûyê xwe berz kir.



Ev şêwe ji sînemakariyê re, weke her pişeyekê yan hunerekê gav bi gav alavên nû bi kar nîn, ji wêneyên tevgerlezgîn bo wêneyên tevgernormal çûn, û ji bêdengiya filman bo deng û muzîka herî pêş ligel çirkeyên filman gav bi gav baştir bû.

Hostebûna alavan di pişeya sînema de, her roj zîrektir bûn.

Eger mirov pêvanekê navbera rewşa film û sînema ji destpêka



film ta pêşandinê (vîzyonê) şirove bike, wê bibhîne ku film û sînema roj bi roj şêweyeke nû nîşanî bîneran dibe. Mirovê aşiqê film û sînema tevilêbûneke seyr e, di filmên ku di rojên îroyîn de tîr sazîkirin dibhîne. Hemû alavên filman ligel akteran bi harmoniyeke mestheş ji temaşevanan re dibirûsin, dibîne ku rola alavên weke Kamêra û hunerên çixîzkirî, û 3Dyan bi tevilheviyeke sirincrakêş di bînesaziya filmên sedsala bîst û yekemîn de zor berbiçav in.

Bidestxistina qezencên malî ji hêla kompaniyên bi sînema têkildarin, bi berhemkirina filman tîr meydanê, û wergirtina qezencan armanceke sereke ye. Peywendiya kompaniyên sînemakar bi berhemkirina filman weke jêderekê ji bo bazara filman weke her madeyekê dikeve nav


barê bazirganiya sedsala bîst û yekemîn de û cihê xwe digrin.

Dewletên ku sînema weke pişe dijmêrin, û filman berhem dikin, dibîne ku du cîgehên mezin li cîhanê hene; Serekêşên van cîgehanên filmsaz: Hollywooda li Amêrîkî, û Bollywooda li Hindistanê. Hollywood Navenda sazkirina filmên ((zengînan)) e, û Bollywood jî navenda çêkirina filmên (xizan û perîşanan) ye. Her yek ji van navendan mijarên filmên xwe yên taybet dirêsin. Tiştê herî balkêş ew e ku her du navend, têknoljiya hevdem di çêkirina berheman de bikartînin. Li derdora wan du cîgehan, hindêk ji navendên dîtir jî ku pişka wan di bazara sînema de, kêma in, hene.

Pirsa ku xwe davêje meydanê: Ma gelo sînema kurdî heye?! Wekî me di sereta de gotibû ku sînema niha weke pişe tê nasandin. Û pişe hemû alav (plato), stûdiyo, derhêner, sênarîst, pisporên deng, wêne, makiyaj û akterên hebin heta ku navê weke pişe li sînemakaran were kirin. Ma gelo ev tişt li kurdistanê heye ku sînema weke pişe bigere, û berhemên xwe li salonên dinyayê

tijî bike?! Bersiva rastego (Na) tê holê.

Gelek sedem li ber pişesaziya sînema li kurdistanê hene. Yek ji wan sedemên sereke ew e ku dewleteke kurdî tune ye ku piştevaniya sînema kurdî bike, û bingeha pişesaziya sînema saz bike, ji ber ku dewletên dagirker hewl didin ku hertim kurd, di hemû waran de, paşdemayî bibin, û bi dewletên dagirker ve girêdayî bibin. Mirov dikare derbarê sînema kurdî bibêje, ku hindêk kesên ku di warê sazkirina filman de dixebitin, hene. Ji wan kesan bi taybetî derhênerên Kurd, ew di serî de ne.



*Wêneyek ji filimê (Pêxemberên Xwedê) ji filima sînemeya Holyodê.*

Gelekan ji wan filmên xwe yên balkêş, bi alîkariya kompanî, têlêvîzîyon, û dewletên biyanî berbî temaşevanan derxistine holê, û mohirên xwe li ser asta hunera sînema navnetewî xistine

meydanê, û navên wan weke sînemakarên dahêner bala ragihandina navnetewî kişandine, û çîrok û filmên wan li ser rûpelên sereke yên ragihandina navnetewî bi xêzên zêrîn hatine nivîsandin.

Ji filmsazên kurd yên zîrek ev in: Yilmaz Guney, Behmen Qubadî, Huner Salem, û Nizamittin Ariç.. H.W.D.



Yilmaz Guney

Weke min di serete de gotibû, ku gelek ji berhemên van dahêneran bi alîkariya dewletan û kompaniyên biyanî bi awayekî giştî hatibûn saz kirin. Çîrokên berhemên wan derhêneran derd û kulên kurdan nîşanî hemû civatên diniyayê dikin, ji ber ku doza gelê Kurd ya resen ji temaşevanên diniyayê re nîşan dane. Mirov dikare bi vekirî bibêje ku rola hunermendên Kurd bo

nasandina doza kurd ji partiyên Kurdî ve, baştir bû.

Yilmaz Guney, di gellek ji filmên xwe û bi taybetî filmê bi sernavê ((Yol)) de, rewşa kambax ya gelê Bakurê Kurdistanê pêşberî temaşevanan dike, û banga şoreşekê li dijî va zulma dualî ku kurd dikşînin, bang dike.

Behmen Qubadî derhêner Rohilatê Kurdistanê, di filmên xwe de, jiyana zarokên Kurd ên di nav şerên li ser xaka Kurdistanê de diqewimin, şirove dike. Hêvî û hestên zarokan ji hêlekê, û berxwedana wan bo bidestxistina pariyeke nan, xwe berdidin nav karê mirovên qert. Di filmê bi sernavê ((dema noşbûna hespan)) Nimûneyeke berbiçav ji rewşa şirovekirî ya zarokên kurdistanê pêşberî cîhanê dike.

Huner Salem di filmên xwe de nêzîk pirsên germ yên civak Kurd dibe. H.Salem bi awayekî sixêf û henek li ber meseleyên şaş yên ku di civaka Kurd de hene, disekine. Huner Salem di filmê bi sernavê ((kilomètre zéro)) behsa dagirkeriya li kurdistanê Başûr ji aliyê dewleta Îraqê ve behs dike. Ew di filmên xwe de nêzîk pirsên germ yên civak Kurd dibe, û bandora vê dagirkirinê li ser astê

peywendiyên navbeyna kurd ereban bi awayekî sixêf tîne ser êkranê.

Hunermend Nizamittin Ariç jî, weke muzîkvan û derhêner tê naskirin. N.Ariç di filmê xwe yê bi sernavê ((stranek ji bo Beko)) trajîdiya parvekirina kurdistanê û komkujiyên li ser kurd tînin barandin, li ser şexsîtiya mirovê kurd, şirove dike.

Dema mirov berhemên ku derhênerên navborî der kirine, binirxîne, dibîne ku gelek ji filmên wan bi piştevaniya dezgehên ewrûpî, yan biyanî rûyê salonên cîhanê dîtine. Rola sermeyadariya Kurd di çêkirina filmên wan de zor kême, yan nîne.

Bi giştî, filmên kurdî, bi hestekî hunerî tînin hûnandin, lê mixwabin, sînema kurdî weke pişer di nav civak û aboriya Kurd de, cih negirtiye. Sedema vê yekê jî tunebûna dewleteke kurdî ye. Hebûna dewleteke kurdî rê li ber dezgehên ku bi sînema re weke pişer têkildar in ava dike? Da ku karibin her sal bi dehan berhemên navdar li salonên diniyayê bo temaşevanan bînin ser êkranan, û Kurd wekû xwedanê civakeke taybet mîratê xwe yê fikrî û felsefî bixe nav filmên saz dike, bavêje nav bazarên filman, da ku rola Kurdan jî di nivîsandina dîroka şahiristaniya mirovatîyê de, hebe.

**Mîr Emîn Alî Bedirxan: 1851 – 1926****(Danerê Rengên Ala Kurdistanê)****Konê Reş**

*Mîr Emîn Alî Bedirxan: Bavê Mîr Sureya, Mîr Celadet û Dr. Kamîran e. Xwendina xwe li Stenbolê di dibistana Sultaniyê de, beşê hiqûqê xwendibû, li mal jî, li ber destê helbestvan Hacî Qadirê Koyî hînî warê kurdewariyê bibû.. Her wiha li Stenbolê ji siyasiyên Kurdan yên herî sereke û berz bû, hem jî ji berpirsiyarên Kurdan yên herî jîr û zîrek bû. Mirov dikare bêje ku piştî koçkirina dawî a bavê wî Mîr Bedirxanê Botî di sala 1868an de li Şamê, barê malbata Bedirxaniyan yê giran, ket ser milên kurê wî Emîn Alî Beg de. Vêca ne tenê Emîn Alî Beg xwe wek berpirsiyarê malbata Bedirxaniyan didît, belê pê re jî dihat naskirin wek berpirsiyarê Kurdan. Û bi germbûn li pey doza gelê xwe de dibeziya. Dema ku mir Bedirxanê, di sala 1847an de hatiye sirgunkirin û di sala 1868an de li Şamê çûye ber rehma Xwedê, sultanê Osmanî rêk nedaye kurên wî bi vegera warê bav û kalan Cizîra Botan, piraniya wan kiriye hakim, walî û paşa, lê li dervî welatê wan Kurdistanê, da ku ji şer û bela wan dûrbe.. Hingî Emin Alî, kiriye hakimê cezayê li*



*Stanbolê, mûfetişê edliyê li Enqerê, Qonyayê, Spartayê û Akkayê.. Di sala 1889an de mîr Emîn Alî Bedirxan digel birayê xwe Miqdad Medehet, kar û barê xwe û serhildanekê li herêma Tirabzûnê kirine, lê mixabin ji ber gelek egeran bi wan re neçûye serî..*

*Bi weşandina rojnameya Kurdistan re li Qahîre, Mîr Emîn Alî Bedirxan piştgiriya birayê xwe Mîr Midhed Beg kiriye û di bin navê (Lawê Ş E. Fetah), rojnameya wî bi vê helbestê pîroz kiriye:*

*Pêrûz ji te re hezar cara*

Ev deng e niho li nav yara  
 Mizgîniya vê cerîdeya qenc  
 Şabaş bitin çîqa hebit genc  
 Ev şixlê mezin te kiriye bideet  
 Cara ewilê te kiriye him-met  
 Ev rehbera qenc te danî binyad  
 Kirmanc hemî te kirine irşad  
 Vê marîfetê tuca nehêle  
 Daim ji te re Mîn resûl e.  
 Roja ku cerîde têtê bajar  
 Her der dibitin mîsalê bazar

Çîqa hebitên li şehrî Ekrad, Qewlê xweşiya te kirne mitad, Rûhaniya bab, kal û ecdad pê vê hinerê te kir niho şad, Beybûniya dewleta te geş bit, Qasî tu hebî dilê te xweş bit..

Ji encamên berxwedana wî, dostanî bi rekeberên Sultan Ebdulhemîd re daniye, ewên ku di sala 1898an de komela "Hevgirtin û Pêşketina Tirkan" saz kiribûn. Ew komela ji rex çar kesên jîr û zîrek hatibû damezirandin, dudo ji wan kurd bûn û herdu jî, dostên herî nêzîk yê Emîn Alî bûn, yek ji wan Dr. Abdella Cewadet û yê din Ishaâ Sikûtî



bû. Mirov dikare bêje ku dor 10 salan Kurd û Tirkan bi hev re xebat kirine, ango ta sala 1908an. Di vê salê de, Tirkên ciwan di holê de hatine xuyakirin û Sultan A. Hemîd neçar bûye ku pêş bi destûrê sala 1876 an bike, anku Huriyet, Edalet û Misawat.

*Miqdad Bedirxan*



Di sala 1908an de, piştî ku Sultan A. Hemîd piş bi destûr kiriye, netewên Impratoriya Osmanî bi hêvî bûne ku her netewek di ber mafê welatîyên xwe de kar û xebatê bikin, rêk li ber Kurdan jî hatiye vekirin û rewşenbîrên Kurdan jî kêmayî nekirine. Wan jî wek rewşenbîrên milletê din xwe di ber mafê gelê xwe de xwe westandine û li ber xwe dane. Di serê wan rewşenbîran de malbata Bedirxaniyan bûn û ji malbata wan yê sereke Emîn Alî Bedirxan bû. Ji hingê ve, mîr Emîn Alî Bedirxan bi welatparêz û evîndarên kurdayetiyê re sekiniye û bi wan re beşdarî avakirin û sazkirina piraniya komele û saziyên ku li Stenbolê hatine damezirandin bûye, wek: Komela Teawin We Tereqî Kurdî, Komela kurdî ji bo belavkirina zanîne, Komela Tealî Kurdistan.. Di destpêka sala 1919an de, di civînek (Komela Tealî Kurdistan) de li Stenbolê, bi serokatiya cîgirêserok wê (Mîr Emîn Alî Bedirxan), biryar hat standin bi serxwebûna Kurdistanê. Hingê Emîn Alî Bedirxan rengên Ala Kurdistanê ji hevalên xwe re pêşkêş kiriye, hevalên wî jî, ew reng pejirandine- eynî vê Ala niha- da ku piştî qewirandina hêzên Tirk û biyanîyan ji xaka Kurdistanê, wê Alê di asmanê Kurdistana azad de bilind bikin.. Hêjaye gotinê ku serokê Komela Tealî Kurdistan Şêx



Abdulqadirê Nehrî bû û digel ku ew di wê hingê de jî serokê senetoran bû di perlementoyê Stenbolê de û ji mêldarên ku kurd û tirk bi hev re bijîn lê Emîn Alî vajî wî dozdkir, wî doza serxwebûna Kurdistanê dikir..

*Kamîran, Sureye û Celadet Bedirxan*

Di sala 1923an de Mistefa Kemal Paşa fermanek bi kuştin û sirgunkirina 150 kesên ku doza serxwebûnê dikin beyan kir. Hingê

navê piraniya malbata Bedirxaniyan di wê lîsteyê de hebû, vêca ji neçarî Emîn Alî Bedirxan û zarokên xwe Tirkîye li şûn xwe hiştin, hatin Sûriyê, gundê Meqtelê, cem Mustafa û Bozan Şahîn begên Eşîra Berazan û bi rêka wan pasportên Sûriyê derxistin û bi şar û welatên dinyê ketin.

Hingî Emîn Alî Bedirxan û kurê xwe yê mezin (Sureya

Bedirxan: Dr Bileç Şêrko) çûn Misrê, bajare Qahire. Û zarokên wî yên din wek Mîr Celadet, Dr. Kamîran, Tewfîq. Sefder çûn Almaniya.. Digel ku mîr Emîn Alî Bedirxan xwediyê danîna rengên Ala Kurdistanê ye, her wiha ew yê duyemîn e, piştî şêx Ehmedê Xanî ku helbest ji zarokan re nivîsiye. Wî, di sala 1906an de, dema ku li Spartayê bû ev helbesta bi navê (Delaliya Zarowan) hunandiye. Ev helbest di kovara Hawarê, hejmata 5an, sala 1932an, li Şamê hatiye weşandin. Di vê helbestê de wiha dibêje:

Dewra felekê li me kîn e

Bextê me reş e, kezeb birîn e

Mekan ji me re niho nivîn e

Binive kezeba min bi navê lo lo

Ne mal û ne saxî û ne rehet

Talan kirine hemî ji mihnet

Dîşwar e gelek belayê xurbet

Binive kezeba min bi navê lo lo..

Emîn Alî Bedirxan, Sparta, 1906 Mîr Emîn Alî Bedirxan di sala 1926an de li bajarê Qahîre çûye ber dîlovaniya Xwedê û lê hate veşartin.

## Êzdî û Xelek - Çîxiz

Silêman Cafer



Di zaroktiya me de, li salên 60î ji sedsala 20an de, dema ku em diçûn dibistana seretayî, hevalên me yê Misilman li dora me dicivîn û em dikirin pêkenok û qeşmer. Em bi perestina Şeytên tewanbar dikirin û digotin win ne Xwedênas in, win Şeytanperest in. Wan li hawîrdora me xelek-çîxiz- çêdikirin û digotin: Êzdiyo ! Eger tu mêr bî, û ne Şeytanperes bî, ji vê çîxizê derkeve! Lê wan hevalên me bi xwe ne dizanîn ku çi wateya vê çîxizê ye.

Wê demê ez gelek tengav dibûm, ma gelo ev wateya ewa bi ola min ve hatiye girêdan?! Min ji xwe re digot: Ez Xwedayekê tek nas dikim, û min nedîtiye ku yek mirovê Êzdî gotiye ez yekîniya Xwedayê tekane napejrînim. Min digot: Ma ne wêneyê pêxember Zeredeşt xuya dike ku çawa Zerdeşt tiliya xwe bilind kiriye û dibêje: Xweda yek e.

Ez diketim pirtûkxanan û min ji rewşenbîran û oldaran dipirsî: Gelo çi wateya çîxizê heye? Ji bo çi hemû kesên derdora Êzdiyan ger mirovekî Êzdî dibînin, darsed çîxizê li dora wî çêdikin, û ji xwe re bi wî dikinin? Li dawiyê ez gihîştim wateya çîxizê û ew jî ev e:

Di dema ku Ereban di riya ola Îslamê re dixwastin bejayî û derdora xwe fireh bikin, û ji Cezîra Erebî derkevin, wan berê xwe dan bakur, ji bo xwe bighînin kurdistanê û dagir bikin, ew rastî berxwedana Kurdan hatin. Kurd wê demê sedî sed Êzdî bûn, ola Îslamê nepejrandin û êrişên Ereban çend caran ji ser welat xwe vejerandin.

Di dema xelîfeyê Îslamî yê diwem Omer Bin Elxetab sala 642Z de, ferman derket ku pêwîste ola Îslamê bighîne hemû deverên kurdistanê, û di

wê demê de desthilatdariya Kurdistanê di destê Sasaniyan de bû.

Dema ku artêşa Ereban nêzî sînorê Kurdistanê bû, rayedarên Sasaniyan mal û malbatên xwe revandin û Kurdên sivîl rû bi rû bi Ereben êrişker re man. Wan êrişkeran wek qorê gêris serê Kuran jê dikirin, Kurd şerpeze bûn tarûmar bûn, derdora 30 hezar keç, bûk û jinên Kurdan revandin, û bi dehhezaran kon li deşta Şehrezorê vegirtin û ew keç û bûkên Kurdan ên dawpak xistinê, û bi dirêjiya 3 mehan namûsa Kurdan winda bû.

Piştî 3 mehan ferman ji Mekayê weha hat: Kurdên ku ola Îslamê nepejirandin, reviyân û ketine çiyân, dive bibin Misilman, an bêne serjêkirin. Bi wê biryar ûmopalê Ereban êrişî Kurdan kirin. Kurd neçar man şer bikin, û çarekê bibînin da ku xwe biparêzin. Femandarekî Kurd got: Kurdno! Her yek li ciyê xwe li dora xwe çîxizekê çêkin û bi nirxên xwe yên olî û netewî sondê bixwin, ku hûnê ta dawiyê şer bikin, ciyê xwe

bernedin, û ger win ji wê xelekê derkevin û bazdin tê wateya ku win ji dijmin re dibêjin: Fermo namûs, rûmet û hemû nirxên me li te fihêl `` helal`` bin. Eger win şehîd bikevin, çavên we destdirêjiya dijmin li ser ax û namûsa we nabînin.

Bi kurtî wateya xelekê - çîxizê-, berxwedan e, azadî ye, serbilindî ye, û tirsê dixê dilê dijmin. Ji ber vê dema desthilatdariya Osmanliyan, û têghîştina wan ji wateya rast ya xelekê -çîxizê-, xwestin wê wateyê pûç bikin û bikin pêkenok. Lê di dema niha de gelê me wateya xelekê baş naskiriye, û bi wê serbilind e.




Bla em di wê baweriyê de bin, ku dijminê gelê Kurd ji sedsalan ve hemû çand û kultûra Kurdan bervaja dike, û her bêje yan


hevokeke Kudan ya pozîtîv ji xwe re dibin, dikin ya xwe û ciyê wê bêje û hevokan çewtiyê dixinê. Ji ber ku şûr di destê wan de bû, piraniya çand û kûltûra Êzdiyan guhartin, ji bo ku ola Êzdî biçûk bikin, gotin Êzdî ji dema hatina Şêx Adî de xuya bûne. Lê em dibêjin: Ola Êzdî kevintir e ji Yezîd bin Mûawiye, ji ola cihû, fileh û ya Îslamê. Ev ol bi tenê ola Kurda ye. Dema gelên derdora Kurdan pût diperestin, Kurdan Xwedayê mezin diperestin, ji ber vê hemû olên li Rojhilata

Navîn destên xwe didane hev da ku ola Kurdan ya berxwedêr ji holê rakin. Dema ku bi şer negihîştine armanca xwe, dest bi xistina bêje û hevokên çewt kirin û xistine çand û kûltûra ola Êzdî.

Hêvîdar im, ku hemû rewşenbîr, dîroknas û rojnemevan çand, kelepûr û kûltûra bav û kalên xwe kom bikin, zelal û dukment bikin, da nifşên pêşerojê mîna me astengiyên ku me didîtine, nebînin.



*Laleşa Nûranî*



**Veqetandek:** Alav - bêje ne, dikevin paşiya navdêran û wan ji wekhevên wê vediqetîne, dide nasîn û têkliya di navbera navdêrê de û bêjeya li paş wê (rengdêr, cinav, navdêr) dide nasîn û pê ve girêdide. Li gor rewşa navdêrê veqetandek bi du şêweyan tên:

**A - Veqetandekên navdêra binavkirî ev in:**

**ê:** Ji bo yekejmara nêr e.  
*Nimûne:* Karmend**ê** zîrek.  
 Heval**ê** te.  
 Ew**ê** biyanî.

**a:** Ji bo yekejmara mê ye.  
*Nimûne:* Karmend**a** zîrek.  
 Heval**a** te.  
 Ew**a** biyanî.

**ên:** ji bo gelejimariya her du zayendan.  
*Nimûne:* Karmend**ên** zîrek. Heval**ên** te. Ew**ên** biyanî.

*Eger tîpa dawiya navdêrê dengdêr be, tîpa " y " ya girêkok dikeve navbera wê û veqetandekê: Rû: Rûyê sipî..*

**B - Veqetandeka navdêra nebinavkirî ( nebîna ).**

Veqetandeka navdêra nebinavkirî bi paşiya navdêrê dikeve:

**Î:** ji bo yekejimara zayenda nêr e.  
*Nimûne:* Kurek**î** zana. Barek**î** giran.

- *Veqetandeka navdêra nebinavkirî Li gor hebûn û nebûna bireser*

**E:** ji bo yekejmara zayenda mê ye.  
*Nimûne:* Darek**e** sêvê. Keçek**e** bedew.

yan rengdêrekê li dû navdêrê, bi du teşeyan tê:

**1 - Tunebûna bireserê, ew wiha ne:**

**ek:** Ji bo yekejimara her du zayendan:

*Nimûne:* Mê**ek** hat. Jine**k** hat.

**in:** Ji bo gelejimariya her du zayendan.

*Nimûne:* Mê**in** hatin. Jine**in** hatin.

**2 - Hebûna bireserekê, ew wiha dibe:**

**ekî:** Ji bo yekejimara zayenda nêr e.

*Nimûne:* Kure**ekî** malê. Bare**ekî** giran.

**eke:** Ji bo yekejimara mê û gelejimariya herdu zayendan.

*Nimûne:* Dare**eke** sêvê. Stranbêj**eke** dengxweş.

**ine:** Ji bo gelejimara herdu zayendan e.

*Nimûne:* Jine**ine** ne nas û mê**ine** biyanî li gund bûn.

### Ferhengok

Qirkirin: إبادة

Komkujî: قتل جماعي

Dûrxistin: ابعاد، نفي

Biryardan: اتخاذ قرار

Beravêtin: اجهاض

Nerazîbûn: استياء

Serpereştî: اشراف

Şanazî: فخر، اعتزاز

Bawerî: اعتقاد

Normal: اعتياد

Lêborîn: اعتذار

Biserdedan: اغارة

Pabendî, pêgirî: التزام

Surûş: ألهام

Spasdarî: امتنان

Xwekuştin: انتحار

Tolvedan: انتقام، ثأر

Riswakin: إهانة

## JI SÎTAVA PÊR



### Merwa Birîm

Şagirtên refê çaremîn di ber dengê mamoste re li benda bidawîkirina waneyê guf bibûn. Piştî ku êvarê kêlîkên Katjimêrê westandin, zengilê dibistanê lêda û mîna moriyên bi coşa tîna roja BUHARÊ em di deriyên refan re derbûn. Li ser tepelkê bilind bajarokê RECO pif dida tiliyên xwe yên ji kurbê terikî bûn.

Di kaşekî bi hilekişan siza bûyî ez bere jêr bezîm, bê bi du keziyên min re dest bi çelediyê kir, bihna bênîşt û şekirê hêlîn ji firoşgeha MÛSQRÛÇÊ firî û xwe li bêvilên min girt. Gavên min sist bûn, ber bi ROJAVA di kişwera xeyalê de tevizîm. Gola HOPKA di nav dîlana darên zêtûnan de kêrsek bi hovîtî dadiqurtandin û herdu rûçik sor dibûn. Wê hîngê hevaleke min berve min bezî û nûçeya mirina dapîra min kir mista min. Bi lez min riya malê min da hev û di rêkoka ber malê de tehtên lîstoka tûşê bêdengiya xwe dicûtin.

Jinekê bi çalakî cobel bi miştika pûşî dadimala, ez bi hêz bezim malê û min deriyê hindur li ser piştê vekir. Bû hêlehêla pîrejinekê deng ji zengilê dibistanê ziravtir bû, û got: Vê zarokê bermedin hindur, em cilan ji ser cendekê pîrê didirînin... Yekê dest da sîngê min û ez bi derve de têvedam.

Wê hîngê xemgîniyê ez dorpêç kirim, ez bi jimartina dilopên avê yên ku ji dewla bîrê diweşin mijûl bûm. Hinekî li ser keviya hewzê gulan rûniştim û di tejika kulîlka QEREGOZÊ re hin hêviyên cilên Zivisatanê germahî dihûnandin. Piştî ku derî vekirin, careke din derbazî hindur bûm. Dengê lorandinê bilind bû, di bin konê xemgîniyê de xaltîka ELÎF bi şewat dev dida ber guhên cendekê sar û digot: Lêêê HELÎM hecî ji min re silav ke. Ê carekê bi desmalê û carekê jî bi dawa fîstên bi pozê xwe digirt û bi hêz fiş dikir. Di ber deriyê textî de ez bibûm mîna şiveke hişke û ziwa. Ne deng û ne liv ji min dihat.





Piştî ku şev li ser pepilan derbazî deşta BALYA bû, çyan dest bi weşandina razan kir, û ji ber pîrbûna mêvanan dayîka min ez şandim mala xaltîka ELÎF, da ku li wir xewkim.

Ew pîrejina jinebî du keçên wê yên canik hebûn, piştî danê yasîna û di nav nivîneke bihin biyanî de xaltîka Elîf dest bi axaftinê kir, û got: Di demên borî de canistîn xwe dikir kar, di embarê de xwe vedişart û bi dizîka dihat canê mirovan distand. Xaltîka Elîf carekê ziman di gulma xwe de gerand û dîsa deng vêket û got: Piştî mirov dimire giyan bere ezmên hidikşe û kûçik li pey giyên zirav zirav direwin. Bi keça xwe ya biçûk re got: Çirê kûrik bike, bes e, divê em xew kin.

Piştî demeke kurt, bû xurxura pîra Elîf û herdu keçên wê di cama rodankê re min êrîşa bayê çoleyê Zivisatanê didît, ku çawa bi şemaqan bi ser riwê dara sicê ketbû û di qelşan re fîtefîta xwe derbazî hindur dikir, û mîna zarokekî mûdî di bin qizêza çirê de, bi zimanê çirê dilîst. Çavên min taqa embara bi cilên kesk mêx dikirin, da ku bibe zîndana canstîne ku dibe sedema têkçûna şahiyê. Lingên min di bin mitila tirsê de bibûn cûmik, û di enkûrê ber malê de bû kûzkûza kûçikekî û riwê şevê diciviland. Ta ketibû hinavên min, ez li pişta bavê xwe digerîm, ku xwe pê hilpesêrim û min nêçîriya bihna dayîka xwe dikir. Herweha koşa şevê bi hêsin dagirtî bû... bi giranî gav davêtin, û qebaqên sîberan zengirî bûn. Gava qil û qirş bi ber solên berbangê ketin û tinginî bi derî ket, min sîtava karê pîrê di tûrikê evsanyan de veşart, dev girêda. Hîn bi dîwarê bîranînên xwe ve daliqiye, û li benda warîne ye.

\*\*\* \*\*




## Ji Ber Ku Ez Jin im

Vejinâ Kurd

Ji ber ku ez jin im, hemû rengên keskesorê li ser lêvên min azan didin û zemawendên tavê di pêlên ronahiya min de vedijenin. Tîrêjên min digihên kişwera zaroktiyê, bîbikên hezkiriyên min, avahiyên herî dijwar û hemû şaxên jiyane bisk û guliyên demê li ber şewqa rûyê min û li ber awazên bilûra dengê min bi ser gund û bajaran de îlahî li ba dibin... Bi tîpên dilsozî û evîndariyê helbesta jînê malik bi malik dihûnim û abeya jiyane dafirînim..

Ji berbanga temenê min ve eşq û evîn ji kaniyên çavên min dizên, lewma bi xwedêwend hatime binavkirin û afirênerê jiyane hemû bedewî, qeşengî û nazdarî di bejn û bala min de berdaye, û dilê min mîna kaniyeke zelal, zîz û delaliyê diherikîne.. Bi geşbîniya xwe asoyên rengereng serxweş dikim, bi pêlên hestên nazik tovên evîne li her derê direşînim û dergeha buhiştê li ser piştê vedikim

Ji ber ku ez jin im, beyaban û zeviyên bûr ji rûyê zemîne radikim, bi aram xwe xem û qisawetan ji sewkiya demsalan dadimalim, firavîna xwe li ber pala xem û kovanan bi dilxweşî dixwem û qet nawestim. Di taldeyê şevan de jî gilî û gazincên xwe bi stêrkan re parve dikim, xwe davêjim bextê heyvê û xemgîniya xwe li piştê wê bardikim... Ji şewqa wê ya zîvî giyanê xwe yê westiyayî ronî dikim, û loda xewnên xwe li ber bayê hêviyan li bere ba dikim.



Nivişta dayikbûnê ya pîroz çirûskên şahiyê li valahiya demên min dipekîne, kenê zarokekî giyanê min di meşka şahiyê de dikeyîne, miltanê êş û derdên min pîne dike û birûskên vînê di dilê min de dijenîne... Erêê... erê.. ji ber ku dayikeka dilovan im.

Ji ber ku ez jin im, qufika temenê min çîrokeke xembar dişopîne û bêzariya ku xwe li bedena demên min pêçaye tovên qêrînan di sîngê hawaran de diçîne û dîwarên mirovahiyê ji qelşan mist dike. Belê... mêrê min konê koletiyê di zemînê hizrên min de vedigire, û destarê ramanan di warê mirinê de digerîne, ezeziya wî şehkirina bisk û keziyên kovanên min girantir dike. Roj û şevên min di argûnkê mejiyê wî de tên sotandin, ez dibim kevokeke ji xemê û dilsotiya fîxanên min baskên min bere keseran difirîne.

Keserên ku sal bi sal bi ser hev de giran bûne, lihevsîwarkirî ne, di nav hev de û ji hev in... Keserên ku min berve mûmên azadiyê dimeşînin û gavên min di siha pêdariyê de gupikên serkeftinan dişopînin û ji bend û qeydan rizgar dikin..

Belê.. ji ber ku ez jin im, coş û pêdariya min tûrikê kul, derd û zorkêşiyên ku li ser min tabî bûne qul dikin û zengilê zanîne li darebesta jiyanê bi deng dikin.



**Wergerandina Hin Çîkdanên Wêjeyî**  
**Yên ``NADRA HESEN``**



``1``

Pelên Payîzê  
yek li pey yekê  
li bere ba dibin...!!!

.....

``2``

Di danehevdana jibîrkinê de  
wêneyekî kevnar  
toz bi ser ketiye...!!!

.....

``3``

Dem Zivistan e -  
di quncikên dilê te de  
bi meraq dilopan dikim...!!!

.....

``4``

Di navbera du ronahiyan de  
sih...  
şêtmêt maye...!!!

.....

``5``

Aram be dilo  
sertiya wan  
bê mebest e...!!

.....

``6``

Çi êş e  
ne tu vegeerî  
û ne ez hatim...!!!

.....

``7``

Ewrekî li dûr  
barîna wî  
bi coşê şil e...!!!

.....

``8``

Li ber deriyê te yê girtî  
baran  
pêgeya tiliyên min  
jê dibe...!!!

.....

``9``

Ji sertiya dûrmayînê  
gul  
bi renekî din in...!!!

.....



**Wergerandin ji erebî:**  
**Merwan Berekat**

NASNAME...



Zekeriya Efrîn

Navê min li ser textê  
Zulmê nivisîn....  
Piştîre ji min re gotin:  
Tu mêrkuj î...  
Kêndir û werîs  
Avêtin gewriya dengê min  
Û gotin: Tu gunehbarî  
Lê tevî ku destê wan ên qirêj  
Li ber siya bejna min  
Mîna rûpelên Payîzê dilerizin  
Stûxwar man  
Di cih de matmayî tevizîn...  
Doza min  
Dozeke bê tewan e  
Tewana min ew e  
Ku hêviyên hejaran  
Di dilê min de zindî dibin  
Li wê derê dilê min

Bi sêdara...  
Serdemên navîn ve Daleqandin  
Û li vê derê gotin:  
Daxwaziya te bi dawî bû.  
Ji bîrkiribûn...  
Ku ez kurê kevana zêrîn im  
Ji bîr dikin....  
Ku ez ji piştî Zagros  
Û Torosan afirî me  
Ji piştî deştî genim...  
Ya Laleşê der bûme...  
Ji tirsê  
Nedixwestin çavên xwe  
Li peyvên ku li ser dilê min  
Nivîsiye bixistana....  
Ji ber ku  
Bi milyonan dil  
Mîna min  
Ji bû  
Azadiyê hene.



### **EM Û ŞEVÊ**

Di pêşîra vê şevê de  
Haaa... ha li ew gundê jorîn  
Me û heyvê  
Çîroka evîneke bi tihin  
Ji hev re digot  
Şev çîroka me ya bê dawî ye  
Ne em jê vedibin  
    Ne jî ew me dihêle  
Bi xunava berî sibehê  
Piştî ku deh caran em şuştin  
Hîn li bendê ye  
Ku bi berbangê re  
Hemû xewnên me binuxmîne  
    Me ji tazîbûnê veşêre.  
Şeveke westiyayî bû  
Şev û heyvê li ber deriyê evîna me  
Nimêja berbangê dikirin  
Ji me re digotin:  
Kaniyên vî gundî  
Ji tîbûnê çikiyan e  
    Evînd|arên vî gundî  
Ji gunehên we  
Bûn dizên ramûsan  
Û li şûna wan gunehan  
    Mirazên xwe girêdan e.

**Hêvîn Hiso**

### **Ewê Vegere**

Ewê vegere  
Tenê  
Bihna xwînê  
    ji pênuşa wî dûr bixe  
Bila ew ji axa welêt re  
Sirûdekê binivîse  
Ew koçber e  
Hevalê jînê ye  
Lal maye  
Vedenga zaroktiyê ye  
Ew  
Xwedî Xewneke tazî ye  
Bayê cengê tund bû ...

**Dr. Yûsif Îbiş**

### **Nerastî bû**

Dilo ew  
Xewnek bû  
Wêneya buharekê bû  
Keskesora berbangekê bû  
Dilopek ji barana sawêran bû  
Xunavek li ser pêşîra xulekekê  
bû  
Asoya di çavên şevê de bû  
Dilo...  
Ew nerastî bû.

**Şivanê Xeyalan**

## Komara Mehabadê ya Kurdistanî

**Jêdera vê gotarê:** Mamoste Kerîm Hûsamî, Çel sal ji Berxwedana ji bo Azadiyê Dr.Ebid-Elrehman Qasimlo - Komara Mihabadê. Pirtûk bi zimanê erebî ye.

Memê Alan

Xwendevanên hêja, armanc û mebesta me ji vê mijarê ew e, ku em ezmûneke dîrokî, ku berî niha bi heftê salî li Kurdistanê - beşê Rojhilat qewimiye û pir nêzîk ezmûna Xweseriya Demokrat a ku niha li Rojavayê Kurdistanê em tê de dijîn bi bîra xwe bînim. Da ku em bi hev re beramber bikin, sûdê ji erênîyên wê ezmûnê bigrin û neyênîyên ezmûna xwe ya îroyîn jî kêr bikin. Û emê li beramberî vê mijarê di hejmara bê de, lêkolînekê li ser xweseriya li Rojavayê Kurdistanê jî biweşînin, wê hîngê bila xwendevan bi xwe her du ezmûnan bide ber hev. Kurdistana Rojhilat ji çar

parêzgehan, ku li Rojavayê Îranê dikevin pêk tê, ew jî ev in:

1 - Ezerbîcana Rojava.

2- Kermênşah. 3 - Kurdistan a ku, rijîma Îranê bi awakî fermî ev nav lê kiriye, û navenda wê jî bajarê Sinê (Senendec) ye.

4- Îlam: Rûbera her çar parêzgehan (125000)km çarkoşeyî ye, hejmara nişteciyên wê îro qaserî (12000 000) kes e, lê dema Komara Mihabadê (3000 000) kes bû, 95% ji mêran nexwende bûn û ya jinan jî 100% bû, civaka kurdî civakeke hozî û êlî bû, aboriya wê çandinî û perwerdekirina dewêr bû, rêxistinkirin nedipejrand û ji fewdalîzmê hez dikir.

Li dirêjya dîroka berî ragihandina Komara Mehabadê, ji hevpymana Qesra Şêrîn a fermî ya sala 1639an di navêna Imperetoriya Farisî û imperetoriya Osmanî de, ya ku Kurdistan di navêna herdiwan de kiriye du perçe û vir ve, hertim Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê li hember destlatên navendî serî hildane û kanîne xudmuxtariya xwe ta nîvê dudiyê ji sedsala nozdehan biparêzin.



**Qadî Mihemed**

Û ya dawiyê li sala 1865an bi destlatdariya malbata Erdelan bû, paytext jî bajarê Sinê (Senendec) bû, û dora (120) salan dirêj kir. Di dû re, li sala 1880îz serhildana Şêx

Obeydelah El-Nehrî dest pê kir, û bi hevkarîya Îran û Turkiyê hate roxandin.

Di dema hevpeymana Sêvirê de, Isma`îl Axa (Simko) kanîbû li hin herêmên Kurdistanê serxwebûn ragihanda û hewil bida, ku yekbûnekê li Başûrê Kurdistanê bi Şêx Mehmûd el-Hefîd re çêkîra, û weha ta sala 1930 î dirêj kir û bi xinizî di civateke guftûgoyî de, bi destê fermanzarekî di artêşa Îranî de hate kuştin. Her weha, serhildana Mehmûd Xan li sala 1926an li herêma Merîwan, serhildana êla Minkûra li salên 1928-1929an li dedora Mehabadê, û serhildana êlên Celalî di salên 1930-1931an de.

Dema ku, Şerê Cîhanê yê yekê li sala 1939an dest pê kir, şahîşahê îranê Rida Behlewî xwe ji Almaniya nazî ve nêzîk kir, lê wexta Almaniya li sala 1941an êrişî Yekîtiya Sovyêtistanê kir, yekîtiya Sovyêtistanê, Emerîka û Ingîz hevpeymana hevkarîyê li dijî Almaniya, Îtaliya û Yabanê çêkîrin, û di pêşî de Sovyêt ji bakur ve û Emerîka û Ingîlîz ji



başûr ve êrişî Îranê kirin û li 25 î Gelewêja sala 1941an diktatoriya Rida Şah hilweşî, vê re heyamek ji azadî û demokrasîyê li Îranê peyda bû, partî û rêxistinên siyasî hinekî geş bûn. Di vê demê de, Mehabad dûrî dagîrkeriya Sovyêt, Emerîka û Ingilîz ma, vê rewşa nû ku çêbûye, bandoreke erênî li Kurdistanê û bi taybetî li Mehabadê kir, hişweriya netewî û siyasî di civaka Kurdî de livand, û hîşt ku yekemîn rêxistina kurdî bi navê Komela vejîna Kurd di 16ê Gelawêjê sala 1942an de, bi serkêşiya yazde kesayetîyan, bi armanca rizgarkirina gelê Kurd were damezrandin. Komele di jiyana xebata Kurdan de rûdaweke nû bû, li sala 1943an kovara Niştîman weşand, her weha didît ku Ingilîz hilgêrê ala rizgarkirina gelan û bi taybetî ya gelê Kurd e, û rola wê ya qirêj di parvekirina Kurdistanê de, di hevpeymanîya Saykis Bîko de, li sala 1916an, û her weha di hevpeymanîya Lozanê de ji bîr dikir. Ji ber rola wê ya lawaz û li şûn di têgihîştina heyama wê hîngê re, peydabûna heyama

demokratîyê di Îranê de bi rengekî feretir, hilweşîna Almanîya û sekeftina xebata pîr mîletan li cîhanê li hember faşîzmê ,bingeheke durust ji avakirina partiyeke kurdî nû re, ku karibe têbîghê rewşa wê hîngê çêkir. Ji ber wê jî, li 16ê Gelawêjê sala 1946an, li bajarê Mehabadê, Partiya Demokrat A Kurdistanê hate damezrandin û armancên wê yê sereke ev bûn.

1- Rêxistinkirina gelê Kurdistanê li dor pirogrameke rêzanî saz kirî û zelal. 2 - Hevgirêdana xebata gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi xebata gelên blindest ên Îranê re, ji bo demokrasîyê, mafên mirovan û li dijî faşîzmê. 3- Xebat ji bo pişgiriya hêzên rizgarîxwaz li cîhanê bi mafên gelê Kurd ên rewşa re li Îranê. Ji bo bicihkirina her sê armancên jorîn, P.D.Kê pirogramek rêzanî zelal ji heyşt xalan bi serkêşiya Qazî Mihemed amede kir.

1- Gerek Gelê Kurd xweseriya xwe di hundir Îranê de bi xwe bi rê ve bibe, û Xudmuxtariya xwe di çarçewa yekîtiya Îranê de be.

2- Zimanê kurdî, bibe zimanê fermî ya Xudmuxtariya Kurdistanê.

3- Hilbijartina encûmenekê ji Kurdistanê re li gor yasaya bingehîn, da ku ew rêvebiriya Kurdistanê bike.

4-Gerek hemî berpirsiyarên Xudmuxtariyê ji xelkê deverê bin.

5 - Sazkirina zagoneke giştî ji bo mafên cotariyan û derbegan bi hev re biparêze.

6-Xebat ji bo hevkarîyê bi hemî gel û kêmetewan û bi taybetî bi gelê Azerbeycanî re.

7 - Gerek P.D.Kê jiyana aborî, çandinî, bazirganî, çandî û tenduristiyê ya gelê Kurdistanê bi pêş xîne, û ji sermiyanên binxak û serxak sûdê bibîne.

8 - Hemî hewildan werin kirin, ku derfet li pêş gelên Îranê

vebin, da ku kanibin welatê xwe bi pêş xînin.

Bi rastî jî, P.D.Kê kanîbû di wexteke nêzîk de, gelê Kurdistanê li dor xwe û pirograma rêzanî bicivanda. Piştî ragihandina P.D.Kê, nema hat veşartin ji tu kesê ve û bi taybetî ji rêvebiriya partiyê ve, ku Îran bi giştî û bi taybetî Kurdistan û Ezerbeycan ber ve bûyerine zor girîng ve diçin, û divê partî di zûtirîn dem de, sûdê ji hemî kanînen hene bigre û bi şev û roj bixebite çimkî dem pir kine. Ji ber wê, ew bi dilsozî û dil û can li ser pir aliyan di heman demê de xebitî, Yekem: Ji bo belavkirina hişweriya netewî û rêzanî di nav cemawerê Kurd de, ew rengxebata jî hêsan bû, ji ber zilm û zora ku gelê Kurd jiya ye.



*Diwem: Ji aliyê xebata rêxistinê de, zehmetî pir bû, ji ber him gelê Kurd jê re ne amede bû û him jî kadroyên bi rêxtinkirinê û siyasetê zanîn kêm bûn, ev bi xwe jî lawaziya herî mezin di partiye de bû. Her weha partiye li rex karên borî, têkeliyên xwe bi partiye hundiir Îranê ,tevgerên rizgarîxwaz li cîhanê û Sovyêtistanê re xurt kir û weha berdewam kir, ta ku roja pêroz di jiyana gelê Kurd bi tevayî û gelê Rojavayê Kurdistanê de bi taybetî hat, piştî (160) rojî ji ragihandina partiye, dema ku li 22. 01. 1946an bi hezaran cemawerê Kurd û nûnerên Kurdistanê ji her çar perçan ber ve bajarê Mehabadê herikîn, da ku li*

*ragihandina Komara Mehabadê beşdar bin. Ew roja dîrokî di heyam û mercên rasthatî de, hate bêlikirin, ji alîkî ve rijîma Îranê hatibû roxandin, ji aliyê din ve gelê Kurd amede bû û Sovyêt jî jê re piştgir bû. Bi rastî jî, di heman rojê de, û di civateke fere de, li kastîna Çiwarçira Komara Mehabadê li ser sêyek ji rûbera Kurdistanê Rojhilat hate ragihandin, û pêşewa Qazî Mihemed bû serokomar.*

*Qadî li pêş wê cemawerê mezin peyivî, rêbaza xebata li pêş komarê ragihand, û Encûmena wezîran a ji sêzde kesayetan pêkdihat bi serkêşiya Hec Babe Şêx hate damezrandin , tevaya wan kesayetan ji çînên orte û*

axe û derbegan bûn, û li (11) ê Reşmeha wê sale, ew nav di Rojnama Kurdistan de hatin weşandin, evên jêrîn jî ew in:

1 - Serok şaliyar: Hac Baba Şêx.

2 - Şalyarê cengê: Mihemed Husên Sêf Qadî.

3 - Şalyarê warên hundirîn: Mihemed Emîn Mihênî.

4 - Şalyarê tendurustiyê: Mihemed Eyûbyan.

5 - Şalyarê dewletê: Ebid-Elrehman Îlîxanî Zade.

6-Şalyarê veguhestinê: Ismayîl Îlîxanî Zade.

7-Şalyarê aboriyê: Ehmed Îlahî.

8 - Şalyarê tilêgraf û birûskê: Kerîm Ehmedîn.

9 - Şalyarê Bazirganiyê: Mistefa Dawodî.

10- Şalyarê zanweriyê: Menaf Kerîmî.

11-Şalyarê çandiniyê: Mehmûd Welî Zade.

12 - Şalyarê ragihandinê: Sedîq Heyderî.

13 - Şalyarê kar: Xelîl esroyî.

Di roja ragihandinê de, ala rengîn hate hildan, bi awakî

fermî bû ala komarê, û ala komarê weha bû, sê rengî bû, sor li jor, sipî di ortê de, kesk li jêr, û dirûşma komarê jî di ortê de ji pênuş û du seriyên gênim pêk dihat. Pênuş şana çand û zanîne bû, genim jî şana kar û berhemdanê bû, û roya li hafa dirûşmê nîşana azadiyê bû. Û sirûda Ey Reqîb jî bi awakî fermî bû sirûda partiyê û komarê.



Zatirê girîngî û simbolbûna Komara Mehabadê, ew e ku, hewildanên dijminê gelê Kurd bû tunekirina wê têk bir, bû ciyê kêfxweşiya hemî Kurdan, û kete wijdan û hişweriya wan a netewî. \*- Kiryar û destkeftiyên Komarê: Jiyandina Komarê pir kurt bû, tenê 330 rojî jiya. Li gor Lêkolîner û şirovekarên siyasî dibêjin, Komarê di demeke nêzîk de, gelek kar û

destkeftiyên mezin û dîrokî pêk anîn.

1 - Di warê çand û zanweriyê de: Mirov dikare bibêje, ku şoreşek di vî warî de hate çêkirin. Zimanê kurdî bû zimanê fermî li seranserî komarê, gelek weşan, rojname û kovar bi zimanê kurdî hatin weşandin, evên jêrîn ji wan weşan û kovaran bûn: Rojnama Kurdistan, dengê P.D.Kê bû, hejmara yekê li 10. 01. 1946an derhat, û 113 hejmar jê derketin. Kovara Kurdistan, Kovara Hawarê Kurd, Kovara Hawarê Niştiman, Kovara wêjeyî ya bi navê Helahe, weşana Kerokalî Mendelanî Kurd, û her weha çapkirin û weşandina gelek pirtûkan û amedekirina pirtûkên perwerdekirinê. Û ji bo pêşxistina zimanê kurdî jî, ji ber pîrbûna rûdawa nexwendinê di nav gel de-cara yekê şanogeheke kurdî hate çêkirin û bi roleke zor girîng rabû. 2 - Rola jina Kurd: Di vî warî de, jina Kurd bi xurtî derbasî

meydana xebatê bû, ev bi xwe ji bo komarê ciyê şanaziyeke mezin bû. Ji bo geşkirin û piştgiriya xebata jinê, Qadî Mihemed kebanî û keçên xwe bi aliyê xebata rêzanî û civakî ve têvedidan, da ku ji yên bilî xwe re bibin pêşeng. Û li (14)î Avdara 1946an, yekîtiya jinên Demokrata Kurdistan hate damezirandin.

3- Damezirandina artêşeke gelêrî bi navê pêşmerge: Di wexteke pir kin de, hêzên pêşmerge hatin çêkirin, bi hezaran ji gelê Kurd tevlê bûn, gelek qumandarên Kurd ên di artêşa Îranê de jî berê xwe dane nav pêşmergan û bi roleke baş rabûn, û pir zû xebata leşgerî geş bû. Lê mixabin, tiştê ne baş ew bû, ku gelek serok êl û hoz ên kêr ezmûn derbasî nav hêzên pêşmergeyan bûn û tenê nîşan bi xwe xistin, wêlomê jî rêzik û perensîpên leşkerî lawaz bûn. Em bi bîr wînin, ku Barzaniyê nemir jî yek ji wan fermanदारên leşkerî, ku di wê hêza leşkerî de alîkar bû.

4 - Pêşxistina rewşa aborî: Bi tevayî rewşa aborî, li seranserî Kurdistanê baş bû, rola Komara Kurdistanê di wê pêşketinê de berz bû, û bi taybetî dema ku bazirganiya yekser bi Sovyetistanê re kir, titûn difrotê û jê tiştên gerek dikirî, vê hîşt ku gelê Kurd hinekî ji belengazî û perîşaniyê derkeve.

5 - Peydakirina ewle û aramiyê: Çendî bi hezaran çekdar hebûn jî, lê aramî û ewle li seranserî komarê belav bû, gel vehesî, li dirêjiya temenê komarê tenê kesek hate kuştin, û dizî, çilekî û genîkirin tucarî nema. Ev bi xwe ji bo komarê serkeftinek bû.

6 - Pihêtkirina têkeliyan bi gel re û avakirina baweriya hevguhêz: Li dirêjiya (11) heyvan, destlata komarê kanîbû bi millet re lihevkirinekê ava bike, ta asta ku, her welatîyekî dît ku, komar ya wî ye, û ew jî perçak jê ye. zafirê ev jî nîşana sazûmanên serkeftî ye.

7-Têkeliyên Komara Mehabadê yên hundur û derve: Bi ser wan deskeftiyên mezin ku pêk hatine, pozbilindî û quretiyê bi



Muhammad Husain Saif i Qazi (1946)

rêvebiriya komarê negirt, bervajî wê ew tim ji metirsiyên kevneperesta Îranê re hişyar û haydar bû, dizanîbû, ku eger guhestineke demokratîk di tevaya Îranê de çênebe, gengaz heye ku ew destkeftiyên hene tevde têk herin. Wêlomê, di siya wê têgihştinê de, rêvebiriye têkeliyên biratî û baş bi hêzên demokratîk re yên di hundur welêt de danîn, mîna komên democrat a Ezerbeycanî, Partiya Tode, Partiya Sosyelîst, û Partiya Çengel..... H.W bi hêzên pêşketî û azadîxwaz yên derve re jî, ta ku, kanibin bi hev re guherîneke demokrat di

welêt de çêkin.Û bi vî awayî Komar bû qubleta hemî azadîxwazan çî li hundur û çî li derve.

8 - Destkeftiya herî mezin ya Komarê: Rizgarbûna gelê Kurd ji zor û metirsiyên artêş û cendirmên Îranê, û bidestxistina çarenûsa xwe cara yekê, ji bo komara Mehabadê deskeftiya tewrî mezin bû.

\*-Destpêkirina dawîbûna Komarê: Li gel wan berhemdayînên mezin, ji rojên pêşîn ji ragihandina Komara



Şehîd Qazî Muhammed      General Mustefa Barzani

Mehabadê ve, hino-hino heyam û mercên alîkar ji ragihandinê re wenda dibûn. Hêzên dagîrker biryar dan, ku hêzên xwe ji Îranê vekşînin, li 01. 02. 1946an Emerîka hêza xwe

kişand, li 02. 02. 1946an Birêtaniya da dû, û Yekîtiya Sovyêt Jî Li 10. 05. 1946an, li gor hevpeymanekê di navbera wê û Îranê de hêza xwe derxist. Îranê jî ji aliyê xwe ve bi her du hukometên teze (Kurdistan û ezerbeycan) re, hevdîtînen xapînok gerandin, da ku ji demê sûdê bigire. Wê ji alîkî ve, li ya Ezerbeycanê di çarçewa welêt de mukûr hat, û kir ku gerek Kurdistan jî pê ve were girêdan. Li aliyê din soz da ku wê hikometeke demokrat û pireng çêke, rast jî çend wezîr ji Tode û Ezerbeycanê tevî hikometa xwe kir.

Li aliyê din jî, di hevdîtînen xwe bi Kurdan re, hemî daxwazên wan red kir. Dema ku, pêşewa Qazî Muhemed ji Tehranê, di Gelewêja sala 1946an de destvala vegeriya, wî dikarîbû bi zanebûna xwe ( yê ku bi pir zimanan dizanî, Ingilîzî, Firensî, Rûsî, Farisî, Turkî û kurdî) têbighîşt, ku pêşeroja Komarê di metirsiyê de ye. Ji ber wê rêvebiriya Komarê, ji tîrsa ku, Îran ji nişkeve êrişekê bi ser Komarê de wîne, wê rabû piraniya pêşmergan di eniya

Segezê ya Kurdistanî (ew ê ku wê hîngê hîn di bin destlata Îranê de bû) de civand. Hejmara Artêşa Kurdî wê hinge (12750) şervan bû, jê (2000) şervan berî ragihandina komarê, bi Barzaiyê nemir re hatin. Dema ku, merc rastî berjewendiya Îranê hatin, wê êriş ser ezerbeycanê kir, endamên Partiya Tode girt, rabû berê xwe da Mehabadê. Ji ber newekheviya her du hêzan, ji aliyê hejmarê, perwerdeyê, rêxistinkirinê û çekan ve, di 17î meha Rêbendan de ,hêza Îranî Mehabad dagîr kir, (28) kes ji rêvebiriya P.D.K ê û komarê girt, ew dan dadgehê, li 9. 02. 1947an Qadî Mihemed berevaniyek wêrek û lehengî li dirêjiya (14) katan, li pêş dadgeha leşkerî pêşkêş kir, û wî dizanîbû ku mirin li bendê ye, û dadkirina wî dadkirina tevgera demokratîk ya tevaya gelê Kurdistanê ye. Dadgehê pir vê re hewildan kir, da ku viyana wî sist bike, her weha Emerîka û Ingilîz jî hewildan, ku piştê xwe bide gelê xwe, lê dilsoziya wî bi sûnda xwe re li pêş gelê

xwe, li (13)î Reşmeha sala 1946an, hîşt ku dadgeh li pêş dilêriya wî xwe xwar û xûz bike. Li 23. 01 .1947an, biryara darvekirina Qadî ji dadgehê derket, lê cîbicîkirina darvekirinê ji ber du sideman (66) rojan bi şûn ket.

Yek: Qadî li ba gelê Kurd pir ciyê hezkirineke bê sînor bû, vêca bidarvekirina wî ne hêsan bû. Diwem: Li ser darvekirina wî di navêna berpirsiyarên Îranî de newekhevî hebû, hin dadweran ne bi darvekirina wî re bûn, û leşkeran jî dilezandin ku were darvekirin, zatirê li dawiyê nêrîna leşkeran bi ser ket, çimkî him nêrîna Rida şah û him jî ya Emerîka (yê ku ji têkeliya wî û Sovyêt ne razî bû) tevî ya wan bûn. Û li dawiyê li berbang 30. 03. 1947an, Qazî Mihemed, birayê wî Ebû Qasem Sedir Qadî û Pismamê wî Mihemed Husên Seyfî Qadî, li Meydana Çarçira, ciyê ragihandina Komarê hatin darevekirin.



